## Ez şêwirmendiyê ji ku bistînim?

Li vir hûn ê me li qada veguhestinê bibînin. Ger pirsên we hebin, ji kerema xwe bi me re têkilî daynin (Şêwirmendiya Pêvajoya Penaberiyê ya Diakonie - Êlekên kesk).

## Cureyên Şêwirmendiyê

Kesane, bi bawerî û belaş.

## Şêwirmendî li cihê Akincîbunê

Karûbarên şêwirmendiyê li cîhên din jî hene. Xizmeta şêwirmendiyê li cihê rûniştina xwe bipirsin.



## Mafên penaxwazan:

1. Mafê serîlêdana penaberiyê.
2. Mafê agahiyan û şêwirdariyê.
3. Mafê bihîstinê.
4. Mafê alîkariya yasayî (hiqûqî).
5. Mafê parastina edlî (parastina dadgehî).

## Têbînîyên min:

SCAN ME

Innere Mission
Diakonisches Werk Bochum e.V.
Fachdienst-Migration und Flucht
Asylverfahrensberatung in der
Landeserstaufnahmeeinrichtung
(LEA) NRW, Bochum
www.diakonie-ruhr.de

Diakonie Ruhr

Gefördert durch:

Bundesministerium
des Innern
und für Heimat

aufgrund eines Beschlusses
des Deutschen Bundestages

Diakonie Ruhr

# Koçberî û Rev

Kurdisch Kurmanci

Консультации по процедурам предоставления убежища

Consultation sur les procedurés d‘asile

استشارة بشأن إجراءات اللجوء

İltica süreci danışmanlığı

**Şêwirmendiya pêvajoya Mafê penaberiyê**

د پناه غوښتنې پروسیجرونو مشوره

Asylum procedures consultation

Asylverfahrensberatung

مُشاوِرِه رَویه های پَناهَندِگی

Flyer Asylverfahrensberatung 2024-9-25 Kurdisch Kurmanci.indd 1
26.09.24 08:07

## Karê me çi ye?

Xizmeta şêwirdariya prosesa penaberiyê ji bo têgihiştina naverok û pêvajoya proseya penaberiyê şîret û piştgirî dide kesên ku li parastinê û penaxwazan digerin. Her weha hûn dikarin ji vê şîretê maf werbigirin ger hûn serîlêdana duyemîn an şopandinek ya penaberiyê bişînin. Her weha hûn dikarin li ser prosedurên betalkirin û vekişandinê û heya biryara dawî ya di proseya penaberiyê de şêwirdariyê bixwazin.

**Bi taybetî, hûn ê li ser mijarên jêrîn şîreta serbixwe, belaş û bi bawerî bistînin:**

- Pêvajoya penaberiyê li Almanya
- Pêvajoya Dublin
- Serlêdana mafê penaberiyê
- Maf û erkên we di pêvajoya penaberiyê de
- Veguhastin: Ez dikarim ji ku derê li cîhê rûniştina xwe ya nû alîkariyê bistînim?
- Amadekirina ji bo Bihîstinê (rûniştina Guhdarîkirinê)
- Îmkanên biryargirtinê yên derbarê serlêdana penaberiyê de

## Pêvajoya penaberiyê li Almanya



### 1. Serlêdan/ Pêşkêşkirina Daxwazîyê:

Kesê ku li Almanyayê li parastinê digere, serlêdana penaberiyê pêşkêşî Daîreya Koç û Penaberan a Federal (BAMF) dike.




### 2. Hevpeyvîna destpêkê:

Piştî şandina serîlêdanê, hevpeyvînek destpêkê pêk tê ku tê de agahdariya kesane ya herî girîng a penaxwaz tê tomar kirin.



### 3. Bihîstin (Rûniştina Guhdarîkirinê):

Divê sedemên revê bi berfirehî bên vegotin. Di heman demê de tê kontrol kirin ka dewletek din a Yekîtiya Ewropî ji proseya penaberiyê (prosedure Dublin) berpirsiyar e.



### 4. Biryara BAMF:

Li gorî agahiyên ku hatine berhevkirin, BAMF biryarê dide ku serlêdana penaberiyênas bike an jî red bike.



### 5. Gavên qanûnî:

Ger serlêdan/Daxwazîya penaberiyê were red kirin, mafê penaxwazan heye ku di demek diyarkirî de dozê li dadgeha berpirsiyar vekin.

## Giring:

Pêvajoya penaberiyê dikare çend hefte heta mehan bidome. Pir girîng e ku hûn her gav navnîşana xwe ya heyî bidin BAMFê.

Diakonie Ruhr